

Dr.Nûredîn Zaza
1919 - 1988

# NEW ROZ

Xebat ji bo :
* Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
* Mafên gelê Kurd ên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de.



Osman Sebrî
1905 - 1993

*Ji weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê*

Hejmar ( 139) | Sal 23 | 25 Cotmeh 2018 z - 2630 k | Êmêl : Newroz@yek-dem.com | Buha (75)L.S


# MA ÇÊ DIBE EM BÊJIN: EFRÎNA JIBÎRBÛYÎ ?!

**Desteya sernivîser**

Eve heft meh bi şev û rojên xwe yên dirêj î reş û giran di ser dagirkirina Efrînê re derbas dibin. Heft meh in, lê ew di jiyana xelkên berxwedêr ên çiyayê Kurmênc de heft sedsal û heft dojeh in.

Heft dojeh in, ji ber ku ew li ser destê artêşa dewleta Turkiyê a dagirker û çekdarên zikreş û kinder ên rikberiya Sûriyê, ew hemû reng û cûreyên zêdegavî, hovîtî û çavsoriyê dibînin û rûmeta wan a mirovatî binpê dibe!..

Ji derveyî hemû zagonên navnetewî û pirensîpên mafên mirov û gelan, rojane



« Meydana Azadî-Efrîn, berî dagirkeriyê »

Kurdên herîma Efrînê toşî talankirin, zindankirin û kuştinê dibin. Bi armanca valakirina deverê ji xwediyên wê yên resen, pilan têne gerandin, teror û tundetûjî li dijî wan birêve diçin. Ew rengemirov ên har ên devbixwîn, dar û berên xelkê ku bi dehsalan e ew çandine, hembêzkirine, bi xwêdana eniya xwe av dane dişewitînin, gorên miriyan xirab dikin diherifînin û di tariya şevan de, xelkên bê sûc û bê guneh ji malan direvînin, wan dikujin û cendekên wan davêjin çolan..! Ma mirov çi bêje û çi nebêje!..

Li hemberî evqas tawan û kiryarên hovane yên ku li dijî hebûna gelê me bikar tên, ewên ku..........

2

# Apê Mûsa Enter… Ji bîr nabe

Mûsa Enter, mîna nivîskar, rojnamevan, zimanhez û têkoşerekî Kurd ê payebilind ne tenê li bakur, lê belê li her çar parçeyên welêt tê naskirin.

Ji bo doza gelê xwe yê perîşan, ta roja dawî a jiyana xwe kar û xebateke bê westan kiriye û gelek caran jî hatiye zîndankirin.

Her kesê ku krtejiyana vî xweşmêrî xwendibe û şopandibe, bêgoman ew dizane bê di dema




darizandina wî de ji bo çapkirin û belavkirina Ferhenga Kurdî çawa bi qerf bersiva dadger daye û berevanî di ber zimanê Kurdî de kiriye.

Roja 20 Êlûna sala 1920an, dezgehên ewlekariya dewleta Turk li Amedê, bi çend guleyan ew kuştine.

Xebatkar û zanayê mezin Mûsa Enter ji bîr nabe û her ew êdi dilê me de bijî.

Berhem

- Birîna Reş - 1959
- Kımıl - 1962
- Ferhenga Kurdî - İstanbul, 1967
- Hatıralarım, cîld 1 - İstanbul, 1991
- Hatıralarım, cîld 2 - İstanbul, 1992
- Çinara Min - İstanbul, Weşanên Avesta

# Ji bo çareseriya Kirîza Sûriyê, giringe em amade bin

**Nûşîn Bêcirmanî**



Piştî derbasbûna heşt salan di ser kirîza Sûriyê re, şerên ku li heremên wê derketine, destêwerdanên dewlêtên derdora wê û yên li dûr û nêzîkî wê jî, hemî alî û hêzên beşdarî di vê kirîzê de kirin, westehan, tev gihane wê baweriya ku pêdivî bi rawestana şer heye, a din, divê çareseriyeke siyasî ji rewşa Sûriyê re were dîtin. Lê mixabin piştî ku welatê me wêran bû, gelê Sûriyê bi milyonan li dewletên cînar û yên li dûr bûne penaber, bi sed hezaran hatin kuştin û weha jî birîndar bûn, ji bilî wan bi deh hezaran hatin binçavkirin û di zindanan de sergom bûne.

Ev kirîz û encamên wê, giring e em weke gelê kurd li rojavayê Kurdistanê û tevgera wî ya siyasî bi hemî partî, çarçew û saziyên civaka sivîl, jê re amade bin, Ji ber tevna çareseriyê xuyaye hin bi hin tê hûnan.

Piştî guhertina terazûyên hêz û hevbendiyên li ser xaka Sûriyê diyar bûn, kurd jî gereke li gorî van guhertinan xwe amade bikin ji rojên bê re...Ji tevgera siyasî ya kurdî li Sûriyê jî tê xwestin ku li ser gelek enî û aliyan bilive, lê enya herî pêwîst di baweriya min de, enya hundurîn e ji ber van sedeman:

1 – Ev enî istiratîcîk e bo biserketina pirsgirêka kurdî û kilîta çareseriya doza kurdî û bidestxistina mafê gelê kurd e...Bêyî wê, aliyên kurdî dê li hember hêzên din di sûriyê de qels bin di hemû milan de, siyasî, leşkerî û diplomasî. Di vî milî de çi tê xwestin:

A – ji saziyên civaka sivîl û kesayetiyên serbixwe, tê xwestin ku givaşê li partî û çarçewên kurdî bikin bo çarçewkirina hêzên kurdî bo pêkanîna yekrêziya kurdî û damezrandina lêvegereke kurdî, ya ku di vê qonaxê de giringtirîn gav e, partî û hêzên siyasî yên xwe nedin ber danûstandinê, gereke bêne diyarkirin ji bal yên di navbera wan de diçin û tên, û li ser alavên ragihandinê .

B – Partî û çarçewên kurdî gerek li xwe û hev jî vegerin, ew diyaloka kilasîk a ku her hêzek xwe tenê bi hemû nerîn û kirdeyên xwe rast û durist dibîne, herweha jî yê li hemberî xwe jî ji kok de şaş dibîne...!! Û dibêje ez diyalogê dixwazim û ezê bikim...! Gelo wê vê diyalokê bi kê re bike?!!! Naxwe ev karê wî bo pirobagendê ye, da neyê xuyakirin ji diyalogê direvê.

Yekrêziya kurdî ne wisa tê pêk anîn, eger em li ezmonên gelan û dewletan binerin, emê bigihin wê rastiya ku dema diyalog tê xwestin ango nakokîn hene, ciyawaziyek di nerîn û helwestan de heye, hêzên miletan jî li hev rûnştine , danûstandin kirine û gihane yekrêziyê piştî ku nakokiyên piçûk paş xistine û berê xwe dane nakokiya sereke, a ku li hember maf û doza wan radiweste. Ev rêzika sereke ye ji diyalogên navxweyî re. Çima partî û hêzên kurdî ji vê rêzikê bider in?! Her partiyek an kesayetike serkirde di çi partiyê de be, dibêje û dide xuyanî kirin, ew û partiya wî amade ne bo diyalogê, yekrêzî jî armanca wî û partiya wî ye... Çima em erê nakin bo diyalogê ta yê li hemberî me nebe weke me, ma naxwe diyalog ji bo çi ye...?!!!

Derfeta zêrîn li pêşiya gelê kurd li rojavayê kurdistanê dubare nabe, roj diçin derbas dibin, partî û çarçewên kurdî di girava nakokiyên partiyane û bê çêj de digevizin...Dewletên xwedî berjewendiyên hevbeş di kirîza Sûriyê de, li hev digerin, civatan lidar dixin, peymanan bi hev re girêdidin... Bo xizmeta berjewendiyên xwe, milê xwe ji hev re datînin.... Gelo, li hember van, tevgera kurdî li Sûriyê çi kiriye? Çi peyman û soz ji hev re dane bo çareseriya doza kurdî li Sûriyê, ji ber, nemaze di vê qonaxa hestyar de, ev qonax wê hebûn an nebûna doza gelê kurd encamê wê bin .

Xwe ji çareseriya kirîza Sûriyê re amade bikin, yan wê çareserî were, lê emê di xewa rikberî û berberiyê partiyane de bimênin.

**Ma çê dibe... Dûmahîk**

mîna daxeke reş di eniya civaka navnetewî de tê jimartin, hêz û dewletên mezin ên cîhanê û dezgeh û rêxistinên navnetewî bê deng û bê hilwest in. Ev bêdengiya wan ji dewleta Turkiyê û hêzên xulamokên wê re rêdaneke aşkere ye û ji gelê me yê kurd re xemgîniyeke mezin a bê sînor e. Efrîn hatiye ji bîrkirin, destê kujer û keriyên hovan hatiye berdan!.

Sed mixabin ku îro siyaseta navdewletî siyaseteke çewt, seqet û kor e, ew li ser rêbaza fîlosovê Îtalî Mîkyavillî bi rêve diçe û armanca wê bidestxistina berjewendiyên piçûk e ne li gora berjewendî û paşeroja gelên cîhanê birêve diçe. Ne tenê wilo, mirov dikare bibêje ku ev ton siyaset di naveroka xwe de li dijî berjewendiyên hemû gelên cîhanê ye.

Mirovatî ser û ber, hevparê avê, jîngeh, aramî û aştiya cîhanê ye, û li kîjan welatî, li kîjan deverê tundrewî, teror û ramanên şoven geş dibin, ben li stoyê azadîxwaz û aştîxwaz û mirovhezan teng dibe û agirê kîna reş a malwêran gur dibe û jiyan tarî dibe.

Tevî birîna kûr a dil, em dibêjin hê dem neçûye, ji bo Efrînê, ji bo man û jiyana gelê me, pêwîste em biqîrin, kul û derdên wê di bîra mirovahiya ker û lal de bînin, çiku Efrîn hewcedara xebat û alîkariya me hemiyan e, û yek ji piçûktirîn erk û ustûbarên me ye.

# Efrîn nehate firotin...

**Memê Alan**

Weke hûn dizanin herêma Efrînê herêmeke kurdî ye, ji sedî nod û pênc ji nişteciyên wê Kurd in û ji heyva Rêbendana sala 2013an de, ji aliyê encûmena Rojavayê Kurdistanê ve tevlî Kobanê û Cezîrê rêvebiriya xweser lê hate ragihandin. Lê divê ji bîr nebe ku Efrîn beşeke ji xaknîgariya Súriyê ye jî û ji hev nayêne qetandin.Yanê rewşa wê bi rewşa sûriyê ya giştî hikar dibe. De ka em bi hev re binêrin ka ji heyşt sala û vir ve li Sûriyê çi dibe û çi diqewime? Ma ne şer û bazarên leşkerî û asayî li dar in? Pìştî ku rikberiya çekdar dest danî ser sedî heftê û pênc ji axa Sûriyê, ji nû ve bi alîkariya Rûsiya û Îranê di gel bazarên ku bi Turkiyê re hatine kirin piraniya herêman ji rikberiya çekdar hate vegerandin û ji nû ve rijîmê dest danî ser .Nimûne Helaba Rojhilat beramberî herêma Cerablûs, Ezaz û Babê, paşê zebedanî, Dareya,....û H.W.D.Vêca ev rewşa tevlihev û girêkok wê çima ji herêmeke weke Efrînê dorpêçkirî dûr be,bi taybetî jî dema ku dewleteke mezin weke Turkiyê, endam di hevpeymana Nato de, xwedî bandoreke sereke di doseya Suriyê de ù bi herdu dewletên mîna Îran û Rûsiya re bazarkar ji roja yekê de dijîtiya hebûna te bike û bi her awî hewl bide ku qeleng jî çi dibe bila bibe te tune bike, û li hemberê jî tu wek Kurd tu tişt li ba te ji bilî qehremanî û fedekariy te tune tu bikî berdêl û qeleng ji Efrînê re.Vêca li vê dawiyê piştî gelek hewidanan ji aliyê Turkiyê ve bi dewletên xwedî hikar û piştî ku dest danî ser Ezaz, Cerablus û Babê, xwest Efrînê jî dagîr bike da ku Rojavayê Çemê Ferêt tev de bixe bin destê xwe, da ku herêma zeytûnan, herêma aştiyê xwîşkên wê Kobanê û Cezîrê biqetîne û pirojeya Federaliya bakurê Sûriyê ya pêşerojê û xwen û hêviyên gelê Kurd li Sûriyê ji holê rake. Bi rastî jî piştî pir zext û fişaran ú berger û sergeran, ew di hewildanên xwe de bi serket û bazara xwe Efrîn beramberî Xota Rojhilat di Esîtana de bire serî û kanî bû bêdengiya cîhanê jî bistanda.Vêca li hember vê yekê Rêvebiriya Xweser di gel YPG,YPJ,QSD û aliyên siysî gelek hewildan kirin ku lihevkirenekê bi hukometa Sûriyê re bikin û Efrînê ji bobelata çêbúye biparêzin, lê mixabin şert û mercên rijîmê û hevalbendên wê xwestine, pir zehmet bûn, ew jî radestkirina Efrînê bi temamî bû. Ev yeka aliyên kurdî nepejrandin û biryara berxwedaniyê çêtir dîtin, bi hêviya belkîm berxwedanî bi xwe re helwestan biguhêre. Di 20.1.2018 an dewleta Turkiyê ya dagirker û hevalbendên wê ji hêzên îslamewî yên radîkal û teror ên rikber di bin navê pirojeya şaxa zeytûnê de û bi hemî çekên cûreyî êriş Efrîna rengîn kirin .Li dirêjiya 33 roian xelkê Efrînê bi giştî tevî rêvebiriyê, hêzên siyasî û leşkerî bi qehremanî û fefekariyeke bêhmpa li ber xwe dan û êrişker neçar kirin ku pênc kîlomitreyên sînorî derbas nekin. Lê mixabin tevî wê berxwedaniyê û wan dastanên lehengî weke Avista Xabûr û Barîn Kobanê, dîsa jî helwestên navdewletî nehatin guhertin û ne jî hevdak por ji serê wan hezî ji bilî hin helwestên fedok li vir an li wir. Her weha, bangên xelkê Efrînê tevî rêvebirî, şervan û partiyên wê yên siyasî ji hukometa Sûriyê re da ku bi erk û stubariyên xwe rabe û di ber beşek ji axa vî welatî de berevaniyê bike fêde nekir û rijîm bêdeng ma. Ji ber ku biryara dagirkeriya Efrînê navdewletî û bê veger jê hatibû standin û li ser aliyan tev jî hatibû ferzkirin. Dîsa jî biryara Kurdan nehate guhertin û berxwedaniyê berdewam kir û soz û peyman ew bû ku wê heya dawiyê jî berdewam be...Ďîsa jî bi hêviya belkîm bajarê Efrînê tenê neçe û were parastin, wêlomê jî xelkê me ji hemî gundewarên Efrînê di bajêr de ta dawiyê man. Lê mixabin ew hêviya jî nema dema ku hêzên şervanên me ji aliyê yên soz dane Turkan de hatin agahdarkirin ku ger şervanek ji we nemîne û bajar jî tev tarûmar bibe, Turkiyê wê Efrînê bibe. Vêca li pêş hêzën me du bijarte tenê man, an wê ta dawiyê şer bikin û tev şehîd bibin û du sê qat bi qaserî wan jî ji sêvîlan ú bajar jî were roxandin û bi erdê re dûz bibe û li dawiyê jî dîsa bajar bê dagîrkirin, an jî ji Efrînê bikşên him şervanên mane werin parastin û him jî bajar wê weke xwe bimîne.Vêca neçar man ku bijarteya kêm zirar vebijêrin û ji Efrînê bikşên. Yanê xwişkino û birano tu kesî Efrîn radest tu alî nekir û ne jî hate firotin, ji ber ku yê ku dora 3000 pakrwan bide Efrînê nafroşe...û ew piropogandeyên têne belavkirin ku rêvebiriyê Efrîn firot û radestî Turkiyê kir,jêdera wan hinde cîhazên istxbaratî ne ...armanc jê ji bo him hikometên xwe ji berpirsiyariyê bidin yan û him me xwe bi xwe di hev de di gumanan kin, da ku em hevdu rûreş bikin û wan jî ji bîr bikin....Li dawiyê çiqas em Kurd haj van ton dafik û xapînokan hebin û pê neyêne xapandin ji pêşeroja me re baş e.




« Li ser gora Şehîdan-Efrîn, berî dagirkeriyê »


# Neçarbûna Efrîniyan… kul û axîn e

**Nazdar Hesen**

Tiştekî normal e, ku her mirovek bi xaka xwe ve girêdayî be û wek parçeyek ji canê wî be û nikaribe jê bi dûr keve. Ji ber ku tamarên mirov di vê xakê de ne û hemû bîranîn û hêviyên xwe pê ve girêdayî ne, bi hêsanî û bê sedem nikare destên xwe jê ber de û bi dûr keve. Belê, welat pir şêrîn û buhaye û qet nirxê wê tune ye, lê mala şerxwezan xera bibe, yên ku dibin sedema sereke ji koçberiyê û dihêlin mirov neçar bibe, ku dest ji xaka wî bibe. Belê şer û windabûna ewlehiyê, mirov neçar dike ku destên wî ji xak, dayîk, bav, dost û hevalên xwe jî bibe, ew bi dilekî şikestî, keserek kûr û bi ramanên tevlihev, biryara herî dijwar dide, berê jiyana xwe diguhêre û ber bi nediyarbûnê ve diçe, ev rewş tu kes pê hestiyar nabe bilî yên tê re derbas bûne wek tê gotin: Gotin ne wek dîtinê ye û êşan ji êşekêşan bipirsin, belê em dikarin bibêjin ev rewş rewşa piraniya Efrîniyan bû ên ku ji ber şer û cengê neçar bûne û dibin, Efrînê li paş xwe bihêlin û devê xwe bidin Çiyayê xewna, tenê bi hezaran kul û birîn di bin persûyên xwe de veşartin û li pê xwe xwîna dadirivî û diherikî, bi çavên melûl wêneya Efrîna xwelîkirî û westiyayî ji cengê oxir dikirin, her dîmenek, her helwestek, her kurtebihnek jê re dibin çêrok û tabloyek û di dîwarê mejî de têne daleqandin. Ji ber wê jî her efrîniyek dibe destan û çêrokek, hemî rê û war li ber têne girtin, tenê du biryarên dijwar li pêş wan hene, an di welatê xwe de koçber bibin û di kampan de bijîn, an li cih û malên xwe yên qijikên reş ên tê de def û gopal bûye yên wan û tarî tê de belav kirine vegerin, helbet her du biryar bi bivehiyan, zor û tehlukiyan dagirtiye û ger ev xak di bin nîrê dagirkerên şerxwaz ên Tirk de bimîne û koçber li cih û malên xwe venegerin, wê her û her efrînî wê binalin, kul û axîn jî wê bidawî nebe û rûmeta jiyana tu kesî ji me jî wê tune be .



# Welato!....




Gava bêhna genimê te dişopînim
Gilêz di hezar dasên çavên min de zingar digire
Çinîn dibe komkujiya demsalan
Kab kulî li werzan dişkin
Pî sar dibin..
Herku..
li pozê her zilekî nasikek dibane
Singê pêdariyê ..
bayê BAKUR di pişta min de..
Diçikîne..
Barana Şiyê di navbera ebrwan de çarmîx dike....

Hîngê....
Mîna genimê te yê şewitî ku ariyê ji rû dawdiweşîne
Gav li gavê siwar dibe..
Û Payîza deşta Qeredaşê giyanê min ji hovitiyê kedî dike..
Newayên xemgîniya berveroyan ji Havînê didize di guhan de dijene..
Û ber te direvim..
Welato.....!

**Facebook 31.07.2018**

# Kelepûr çî ye?

**Heyder Omer**



Hemî lêgerînên anthropology û lêkolînên folklor hema hema lihev dikin, ku hemî cûreyên derbirîna gel, bi çi awayî bin jî, ji bingehên xwe de li gor hewcedariya civakî û mirovahiyê beyda dibin. Armanca wan cureyan jî ew e, ku çawaniya realîteyê di xeyala gelan de, û çawaniya nerîna wan li ser heyînê û jiyanê, û awayê şirovekirina diyardeyên, ku hişê mirovî li hemberê ji hêz dikeve, û nikare têbigihêne, bidin xuyakirin.

Ji ber vê yekê jî, em dikarin weha biçin, ku kelepûr gencîneya ezmûneyên civakên mirovahiyê, û dîroka bûyerên, ku bi wan civakan re qewimîne ye, pê re jî tê xuyan, ku ew mîrata (bermayê) mirovahiyê ya bê sînorên cîgeh û demê ye. Ev jî ji herdu hêlên zanîn û dîrokê ve dide xuyakirin, ku hemî gelên cîhanê, di karkirin û avakirina berdewam de, hevpar in, çimkê her civaka mirovahiyê, li gor awa û forma xwe, û li gor pileya hişyariya xwe, çanda xwe ya gelêrî a taybet he ye, û di heman demê de jî dibe pareke kelepûra tevayê mirovahiyê.

Ev rengdêrên hanê, pirê caran bûne sedema wekheviya hêmanên kelepûra vegotinê (çîrok, efsan, metelok û pendên gelêrî…û hwd) çi ji hêla durvê wan, û çi jî ji hêla naveroka wan de. Sedema vê yekê, bi nerîna min, hem wekheviyan ezmûnên mirovahiyê ye, û hem jî xweristiya hişê mirovahiyê ye, yê ku bi tayetbmendiya xwe her tim sedeman dipelîne, û dikeve ber bandora encaman, çimkê nirxên mîna toleransê û dadweriyê û xêrxwaziyê û maf û ciwaniyê, û nirxên ne mirovane wek zorê û sitemê, li her dem û her cihî yekwateyî ne, û nayêne guhertin; vê lomê em dikarin, wek nimûne, pendekê, metelokekê, çîrokekê bi wateyên hevpar li her der û demê bibînin. Nimûne: penda kurdî dibêje „*Geyayê hewşê tehl e*“, li kêlekê ya erebî dibêje „*Pêximber li ba miletê xwe nayê rûmetkirin*“, û penda aşûrî dibêje „*Gûz ji hundirê xwe de gendel dibe*“, û li kêlekê ya kurdî dibêje „ *Kurmê darê ji darê ye*“ û ya erebî jî dibêje „*kurmê sîrkeyê ji sîrkeyê ye û di nava wê de ye*“. Folklornasa Misirê Nebîle Îbrahîm jî vê yekê diçespîne û dibêje:“*Hemî cûreyên derbirînên (vegotinên) gelêr, ji hêla durv û naverokê de, pir hindik wek hev in*“.

Lê tevî vê jî her miletekî tevdîr û huner û awayên jiyanê û nasname û resenî û taybetî yên xwe he ne; evan hemî vêkra bi kelepûra miletan têne navandin, û kesayetiya wan a çandî û netewî û şaristanî pêk tînin, û ji ya miletên din cuda dikin.



« Beşek ji kela Horî-Efrîn »

Dêmek kelepûr, ji her du warên giyanî û keresteyî (maddî) ve, û li gor dem û cihê, ku tê de hatiye pêk anîn û afirandin, bermayê bavan û bavpîran e, her nifşek ji ber ê beriya xwe werdigire, û li gor serdema xwe jî bi ser ve dike, û dighênê nifşê din.

Gava milet kelepûra xwe vedijînin, ne ku bîra buhêrkê kirine, û ji niho û duhatûwa xwe baz didin, belê ji bo sûdwergirtina çandî ye, da ber bi pêş de, ber bi asta ramana navdewletî de hilkişin. Bi vî awayî mirov dikar, di civaka xwe de, pabendiya bi kelepûrê ji hêlekê de, û xebata pêşveçûna, ku bi bandora guhertinên li dinyayê peyda dibin, binerxîne, çimkê wek ku hatiye gotin, ê ku buhêreka xwe nîne, niho û duhatûwa wî jî nîne.

Kelepûr bi ser du beşan de par vedibe: Kelepûra keresteyî (maddî), ku şûnwarên dîrokî, cil û berg, amûrên çandinê, awayên xwarinan, awayên avakirina xaniyan, û hwd…, diyardeyên wê ne, û kelepûra vegotinê, ku efsan û çîrok û pend û metelok û kulam û helbesta gelêrî û destan û têderxistinok û hwd … diyardeyên wê ne. Ev cureyan hemî bi awayê lêvane (devkî) ji dapîr û bavpîran, ji dayik û bavan, ji nifşekî dighên nifşê din.

Di serdema neteweya romatîk de bal ber bi folklor û vejandina kelepûr de hate kişandin, nemaze li almayayê, û pêr e jî ramanbîr û fîlozofên gelek walatan cefayên giran û giranbuha di vî warî de, ji bo parastina kelepûrê, diyarî milet û gelên xwe kirin.



**Salvegera koç... Dûmahîk**

û bê çarenûs bimînin!.

Diwarê Kurdî de û piştî ku li sala bûrî çekdarên Heşid El şebî yê girêdayî rijêma Îranê ya paşverû û xwînrêj êrîş birin ser deverên ku ji xaka başûrê Kurdistanê hatibûne birîn û dagîrkirina kerkûkê, û pişt re jî, tewana dagîrkirina Efrînê ji bal artêşa dewleta Turkiyê ve bi rêkeftina dewleta Emerîkayê û berdana destên kujer p sûtarên kubinavê «Artêşa Azad» bi armanca guhertina dêmofrafî ya deverê û valakirina gund û bajarên Kurdan asaqan tînin serê gelê me yê sivîl û hewl didin ku Kurdan neçar bikin da xaka bav û bapîran berdin, rez û zeviyên xwe li şûn bihêlin û birevin û welatê wan bê xwedî bimîne.! Evqas kirayarên hovane û tewanên bêmînak li pêş çavên civaka navdewletî dibin bê ku tu kes dengê xwe li hember vê sitemê blind bike, Kurd bêzar bûn û bi xurtî hatin hejandin, nemaze ji hilwesta hevalbendên xwedî biryar yên ku bi wan re şerê terora cîhanê dikirin!..

Kurdan hêvî dikir ku piştî bidawîbûna şerê terorê, mafên wan jî li wan vegerin û ew jî mîna gelên cîhanê azad û bi rûmet bijîn,nemaze ku şervanên wan(Pêşmerge, YPG û YPJ) di gastînên şer de mêrxasîne balkêş û bê mînak nîşan dan ku civaka navnetewî matmyî ma û xwe pê şanaz û payebilind didîtin, û tucarî bawer nedikirin ku li şûna wan xewn û hêviyan careke din destê rijêmên deverê li wan bê berdan û bêne kuştin, talankirin û careke din sitembariya Kurdan vegere çargşeya xwe ya pêşîn!... Di vê derbarê de, her kes dizane bê partiya me çi kar, xebat û çalakiyên aştiyane li welêt û li deverê dike, tewanên rojane yên artêşa Turkiyê û hevalbendên wê li dij xelk û kesên me li Efrînî dikin, ji kuştin, revandin, şewitandina zeviyan û wêrankirina berma û şûnwarên Kurdî belge dike û radestî aliyên navnetewî dike.

Beşdarên bi rûmet..

Wekî hûn dizanin, bi armanca parastina ewlwhiya deverên me piştî valahiya ku rijêmê li şûn vekişîna xwe hişt, baweriya me ew bû ku hebûna zagoneke qels û kêm jiserberdayetiyê çêtir e, ewa ku jiyan xelkê toşî metirsiyan dike, biryara Partiya me ew bû ku em têkiliyeke erênî bi rêveberiya xweser a demokratîk re bikin û hê jî em bi bawerî dikin. Û tukesekî xwedî hiş û hest, nikare rajeyên vê Rêveberiyê, nemaze di warê karguzarî û ewlehiyê de bide mandelê, çiku ew li ber çavan in. Herwiha, ji bo sivikirina dijwariyên jiyanê û sistkirina ben li stoyê gelê me, me beşdarî di Encûmena Sûriyê ya Demokrat de kir. Lê, giring e ev neyê wê wateyê ku mafê me yê nerîn û derbirînê bê xwarin, û pêwiste nerîn û hilwestên me bêne rêzgirtin. Em ê şaşî û gendeliya ji bal hin berpirs û dezgehên rêveberiyê ve têne kirin rexne bikin, çimku ew bandorek neyênî û xirab li jiyana mirovan p paşeroja wan dikin, mîna çawa li van rojan, rêveberî êrîşê berdide ser xwendekarên ku li dibistanên fermî yên rijêmê dixwînin, û pêwiste em hemû bi hev re kêşeyên welatiyên xwe çareser bikin, hemû hêz û partiyên siyasî , kes û aliyên pispor beşdariyê di civînên hevbeş de bikin da ku biryarên çewt û şaş neyên wergirtin, û deverên xwe ji xiecir û pevçûnan biparêzin, ewa ku aliyên xêrnexwaz û kîndar dixwazin aramiya wan têk bibin û aştiya civakî birûxînin.

Li dawiwyê,em dibêjin û em bawer in ku gelê me bi vîna xwe dê vê qonaxa têkilhev derbas bike, û ewê xebata xwe ji bo bidestxistina mafên xwe yên windayî berdewam bike. Li hêla din, li gel hemû cefa û zehmetiyan , bê dudilî, em ê berdewamiyê di xebata xwe ya ji bo yekrêzî û yekdengiya Kurdan de bikin, ewa ku gorbihuşt Ismayîl Umer bingehên wê danîne, jiyana xwe di ber de winda kiriye, û em ji w rêyê nagerin. Em hiner û xurtiya xwe ji piştgiriya we werdigrin.

Silav ji giyanê xebatkar Ismayîl Umer re.

Silav ji giyanê hemû pakrewanên welêt re.

Û spas ji guhdariya we re.



*-Cî û warê Îsmaîl Umer li ba Sultan başa-el-etreş, şêx salih el-elî û Îbrahîm Henano ye!.*

*- Cî û warê Îsmaîl Umer li ba Dr.Qasimlo, şerefkendî, Samî Ebdirehman û Mele Mustefa Berzanî ye!*

*-Cî û warê Îsmaîl Umer li ba Mûsa Enter, Fayiq Bocaq û Seîd Alçî ye!*

*-Cî û warê Îsmaîl Umer li ba Hemze Niwêran, Cegerxwîn, Osman Sebrî û Dr.Nûredîn Zaza ye!*

*-Cî û warê Îsmaîl Umer li ba Ebdilhemîd Zîbar, Ebdirehman Osman û Dr.Newaf Husên e!*

**Mihyedîn Şêx Allî**

*Qereqoy 19.10.2010z*



**Salvegera koç... Dûmahîk**

siyasî bi realîstî bixwîne, binirxîne, û bi singeke fireh û hişekî vekirî têkiliyê pê re bike û hilwestê ava bike. Herweha, ew yek ji wefadarên raman û rêbaza xebatkarên Kurd ên pêşîn yên yekemîn Partiya Kurdî ya siyasî li Sûriyê damezrandine mîna» Osman Sebrî, Xalid Mihemed, Ebdilhemîd Derwîş, Hemze Niwêran, Reşîd Hemo, Şweket Nesan û Mihemed Elî Xoce» bû. Û ew yek ji şagirtên dibistana siyastvanê Kurd ê bîrewer û zîrek Dr.Nûredîn Zaza bû ku ji bo doza gelê Kurd a dadmend bê dudilî dabû ser rêya wan û dixebitî û hemû jiyana xwe ji bona pêkanîna wê armancê terxandibû.

Di warê avakirina hilwesta siyasî derbarê tevgera Kurdî û pirsa niştimanperweriya Sûriyê, mamosteyê me, karîbû bi hostayetî bersivê ji vê pirsê re bibîne û girêdanê têxe navbera têgeha xebata netewî ya Kurdî û rewatiya berevaniyê di ber armancên wê de, û xebata niştimaniya Sûrî ya giştî de. Û ji ber ku ew mirovekî zana û têgihiştî bû, karîbû deng û hilwesta gelek rewşenbîr û siyasetmedarên niştimanperwer ên Ereb li kêleka vê baweriyê bicivîne, û wan jê re bike dost û alîgir, ji ber ku doza Kurdî li Sûriyê dozeke niştimanî ye, û ew çareseriyekê li ser bingeha wekheviyê di erk û mafan de di navbera hemû pêkhateyên Sûriyê de bê cudahî û bê bê sitem û di çarçewa yekîtiya welêt de dixwaze. Li sala 2005an, Danezana Şamê hate damezrandin ku xwesteka



wê, girêdana kongireke guftûgoya niştimanî di navbera hêzên Sûrî de bi armanca veguhestina Sûriyê berew guhertineke siyasî aştiyane û pêkanîna demokrasiyê û rehabûn ji çavsroriy rijêma totalîter û desthilatdariya dezgehên ewlehiyê. Nerîna wî ya stratîjîk derbarê guftûgoyê weke rê û rêbazeke tekane ji bo çareseriya hemû pirsên niştimanî rast û dirust bû, ji ber ku serkutkirin, tund û tûjî, girtin û zindankirina xelkê û têkiliyên ewlehî, tucarî ji pirsên netewî re nabin bersiv û derman.

**Gelî xoşewistan!..**

Di vê bîranîn û helkeftinê de, pêwiste em hinekî bi kurtî be jî dagerin rewşa siyasî ya giştî û ronahiyê bidin hin aliyên rewş û pergala welatê me Sûriyê ku ji berî derdora 8 salan ve ew toşî şerekî bê wate û gemar bûye, ku gel jê westiya ye, bêzar bûye, û welat kavil û wêran bûye. Ew şerê ku rijêma çavsor a Şamê berpisiyariya wê ya sereke hiltîne, rijêma ku hêz û hinera xwe ji alîkariya Îranê, Hizbullah a Linbanê û piştgiriya leşkerî, siyasî û diplomasî ya Rûsyayê wergirtiye û hê jî werdigire.

Ji hêleke din ve, herwiha, rikberiya Sûrî ya islamewî ku di laşê rêxistina Ixwan El muslimîn a kevneperest û paşverû de hatiye pişaftin û biryara xwe ya siyasî radestî hin dewletên deverê yên mîna Turkiyê û hin dewlet mîrgehên kendava Erebî kiriye, ew dewletên ku wê mîna pelikeke bazarê ji bo pêkanîna berjewendiyên xwe di bazara siyaseta nevnetewî de, dûr ji maf û xwestekên gelê Sûriyê û hêviyên wî di aramî, aştî û jiyaneke azad de bikar tînin û tevdigerin.

Herweha, civaka navnetewî jî parekê ji vê berpirsiyariya giran hildigre, ji ber ku li dirêjiya van 8 salan wê nikarîbû rê li pêş rijandina xwîna xelkên Sûriyê bigre û çareseriyeke aştiyane ji vê kirîzê re bibîne, ew a ku aramî û ewlehiya deverê û ya navnetewî bi tevayî daye ber gef û metirsiyan, çirûskên agirê wê roj bi roj belav dibin, koçberên Sûrî berew dewletên dinyayê ve ji ber kuştinê direvin, li aramî û aştiyê digerin, ew aramiya ku li ser vê xaka gerdûnê ya fireh û ta deryayên wê yên bê binê de jî nedîtine û pê şa nebûne!..

Li ber çavan e ku Turkiyê rikberiya Sûrî û hêzên Islamî yên terorist û radîkal ji bo pêkanîna armancên xwe bikar tîne, ew armancên ku mirov dikare bi di xalan destnîşan bike ku ya pêşî neyartiya mafên gelê Kurd e, û ya din jî, dixwaze ku hin dever ji xaka Sûriyê bi ser sînorê dewleta xwe ve berde, wekî çawaberî niha Lîwa-Iskenderon a Sûriyê sitand.

Di siha gurbûna agirê rikberiyê di navbera dewletên mezin ên cîhanê de, ewên ku îroli ser berjewendiyên xwe ketine qirika hev, şerê hev ê siyasî dikin, bandora xwe ya neyênî li kar û barê Yekîtiya Netewan û biryarên wê kiriye,ew pûç, seqet û bê hêz kiriye. Di van merc û hoyên awarte de, ku tu rêz ji zagona navetewî re nema ye, bi erêkirina Rûsya û Emerîkayê, zêdegavî ser sînorê dewletek cîran û di Yekîtiya Netewan de endam e, Turkiyê Cerablus û Efrîna Kurdan dagîr kir, û civaka navnetewî ser û ber, li hemberî vê tewanê ker û lal û bê deng e!. Herwiha di vê çarçewê de, û bi behaneya şerê li dij terorê, bakurê dewlet Iraq a Federal toşî êrîşên leşkerî asîmanî û yên bejî dibe, ev xapandin û derewên ku nema baweriya tu kes û aliyan pê nayê, ji ber ku her kes têkiliyên nehênî di navbera wê û rêxistinên terorist ên cîhanê yên mîna El Qayîde, Cebhet El Nusre û Daişê de dinasin. Û derbarê hewildanên wê bo êşandina doza Kurdî ûberavêtina armancên wê, îro, i hemû hêza xwe, Turkiyê hewil dide ku kurdan beşdariyê di komîta navnetewî ya nivîsandina reşbeleka makezagona Sûriyê de nekin û wan jê bidûr dixîne, da ku her û her Kurd bindest, kole û çavgirtî bimînin, her zor û sitem ser singa wan bimîne, û her ew bê vîn.........

6

# Di heştemîn salvegera koçkirina xebatkarê Kurd ê navdar Ismayîl Umer de

# Hêvî û Xemgînî



Mîna vê rojê berî 8 salan, dilê xebatkarê Kurd ê dilsoz Ismayîl Umer/Serokê PYDKS rawestiya, ji nav me bar kir, û bi beşdariya hizaran kes ji nûnerên partiyên Kurdî, dost û hevalên wî di vê xaka pîroz de, xaka bav û bapîran de hate xatirxwestin û veşartin. Bi çûna wî, ne tenê tevgera me ya Kurdî li Sûriyê û ya Kurdistanî, lê belê herwisa tevgera niştimanî ya Sûriyê bi tevayî, bîrwerekî xwe yê zîrek, çalak û şareza winda kir.

Mîna rewşenbîrekî berpirsiyar, mamoste Ismayîl Umer ji dil û can dixwest ku bi erkên xwe yên welaparêzî rabe, li hember sitem û çavsoriya zordestan bê deng û bê hilwest nemîne, pişta xwe nede derd, kul û xemên gelê xwe û ji bo doza wî karekî kêrhatî bike. Ji ber vê yekê jî, berî her tiştî, wî giranî da mijara xurtkirina tevgera Kurdî û guhertina alav û şêweyên xebatê. Giranî da guhertina berê têkoşîna gel berew neyarên wî yên rastî, ewên ku mafên wî binpê dikin, pilanên şoven û kiryarên ne mirovane derbarê hebûna wî dirêsin û bi kar tînin, mîna pirojeya Kembera Erebî û Serhijmara awarte li herêma Cizîrê ji bilî şerê wan ê pilankirî ser ziman, folklor û toreya kurdî. Ji ber wilo jî, tevî ku wî dizanî ev rê, rêyeke ne dûz e, tev rêl û kelem e jî, lê, di partiya wî de yekirina rêzên tevgerê di yek çarçewê de bû yek ji armancên sereke.

Bi kurtî, dûr ji hûrguliyên siyasetê û şax û paxên wê yên tevlihev, wekî çawa diho û pêr yekîtiya me Kurdan pêwist bû, îro jî, nemaze piştî ketina Kerkûk û Efrînê, diyar dibe ku dermanê derdê me, yekîtiya rêz û rêxistinên me yên bira ye. Eger em bi erkên xwe yên ranebin, nakokiyên partriyetî yên piçûk nedin hêlekê û dest nedin hev, li hember dîrokê em ê berpisiyar bin û bêne darizandin!..

Bi vê bûneya xemgîn, li gundê Qereqoyê, gelek dost, heval û alîgirên partiyê li ser gorna birêz Ismayîl kom bûn, bi rêzgirtin ew bibîr anîn.

Li demjimêr 11ê berî nîvro, mêvanan serdana gora nemir kirin û FATIHA li ser giyanê wî xwendin, gurzê gulan li ser gora wî danîn, pişt re merasîma dest pêkir, mamoste Behzad Emo bixêrhatina mêvanan kir, ji wan xwest ku demeke bê deng li ser giyanên pakrewanên kurd û kurdistanê rawestin.

Birêz Mustefa Meşayix/ cîgirê sekreterê Partiya PYDKS li ser navê komîta birêvebir a Partiyê gotinek bi zimanê Erebî pêşkêşî beşdaran kir û ev e Wegera deqa wê ye:

**Xwişk û birayên beşdar**
**Mêvanên birêz**
**Malbata gorbihuşt..**

Di destpêka vê gotinê de, bi me xweş e ku em xêrhatin û sipasiya we bikin ku we ewqas westan û cefa kişandiye da ku hûn bi rêzdarî li hemberî vî xweşmêrê dilsoz rawestin û wîbibîr bînin û mîna wefadariyekê derbarî mirovekî ku ji dil û can jib o doza gelê xwe ta dawiya jiyana xwe, xebateke bê westan kiriye, û bi hûn koçkirina wî ya ji nişka û bi lez êşiyan û xemgîn bûn. Herweha, hemû xebatkarên Sûrî yên ji bo doza azadiyê, rûmeta welatî û welat têdikoşin, bi barkirina wî xemgîn û dilbirîn bûn.

Ew, yek ji serkirdeyên herî berz ê tevgera netewî yay a Kurdî li Sûriyê bû ku karîbû rewşa.........

7




**Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re, yên di girtîgehên Sûriyê de**